Şemalkek ku nevemirit

Berhevkirin: Fehîma Îbrahîm

Zarokên delal..

Hûn dizanin rêkek ya hey bo çêkirina şemalkekê ku heker pif kenê jî navemirit!

Bi tine dê bi rêkekê vemirit, ew jî heker oksicîn jê hate birîn.

Heker we hez kir bi vê serborê rabibin, we pêdivî bi parçeyeka pembî yan jî ya kitanî heye di gel hindek xuwê ya xwarinê û şemalkekê.

Ewê parçeya pembî yan ya kitanî di xuwê re bihêle, paşî wê parçeya di xuwê re têrbûy, di şemalkê bi alîne û şemalka xwe hilke û bizavê bike ku bivemirînî.

.• Jêder: Pirtuka serborên kîmyayî û fîzîkî

Çend pêzanînek li dor pişîkê

A: Revîn Ekrem

Pişîk mişka naxot xo heger ya birsî - jî bît heta têr yarya pê neket.

- Pişîk melevaniya dizanît, belê hez ji avê naket.
- Pişîk hez diket bi şevê bimînîte di jorve; çunkî wî demî wê zû sar dibît.
- Pişîk gelek zû hest bi tiştî diket û çend metirsî ya jê dûr bît, guh lê dibît .xo heger ya nivistî jî bît